

# Hûn û Anesteziya We

Ev belavok agahdariyê dide ku ji we re bibe alîkar ku hûn ji bo anesteziyê amade bibin. Ew ji aliyê bijîşkên anesteziyê (anestezîstan) ku bi nexweşan û wekîlê nexweşan re dixebitin ve hatiye nivîsandin. Herwiha ew nîşanî we dide ku hûn li ku derê agahiyên zêde û kêrhatî bibînin.

## Anestezi çî ye?

**Anesthezî** nahêle hûn bi tu êş û hestên giran bihesin. Ew dibe bi awayên cûrbecûr were dayîn û hewce nake ku we hergav bêhiş bike.

Li gorî awayên dayînê, va ne cûreyên cûda yên anesteziyê:

**Anesteziya deverî** bi rêya derziyê beşek biçûk ji leşê we ditevizîne. Hûn hişyar dimînin û bi tu êş nahesin.

**Anesteziya herêmî**, wek mînak di hemû pişt de, derzîkirînen beşek mezin an kûr ji leşê bêhest dike. Hûn hişyar dimînin an hinek dermanên hedarkirinê distînin, lê hûn bi tu êş nahesin. Ji bo hin emeliyatan dibe ku hûn ji hestên zextê haydar bin.

**Anesteziya giştî** rewşa bêhişbûna raserkirî dide. Ew ji bo hin emeliyat û rêbazan girîng e. Hûn ne li ser hişê xwe ne û ne jî bi tu tiştî dihesin.

**Dermanên Hedarkirinê** dike yek di rewşa 'mîna xewê' re derbas bibe û pir caran ev yeka bi anesteziya deverî an herêmî tê bikaranîn. Dibe ku dermanên hedarkirinê sivik an giran bin û dibe ku hûn her tiştî, tişteki an ne tu tiştî piştî hedarbûnê bi bîr bin.



Ji bo agahiyên zêde li ser dermanên hedarkirinê, hûn dikarin belavoka me ya li ser hedarkirinê ku li ser malpera me berdest e bibînin: [rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation](https://rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation)

## Bijîşkên Anesteziyê (Anestezîst)

Anestezîst bijîşkên ku bi perwerdehiya xwe ya pispor:

- Bi we re li ser cûre an cûreyên anesteziyê ku ji bo emeliyata we bikêrhatî ne gotûbêj dikin. Heger di vê yekê de bijare hebin, ew ê di hilbijartinê de alîkariya we bikin.

## Hûn û Anesteziya We

- bi we re li ser talûkeyên anesteziyê gotûbêj bikin .
- bi we re bernameyek ji bo anesteziya we û çavdêrîkirina êşê piştî emaliyetê pêkbînin.
- anesteziya we bidin û ji bo tenduristî û ewlehiya we li seranserê emaliyetê û di odeya başbûnê de berpîrsiyar bin.

Û herwiha hûn dikarin bi Hevkarên anesteziyê ku di çavdêriya tenduristî de pir pispor in re bicivin. Hûn dikarin li ser malpera me zêde der karê wan û koma anesteziyê bixwînin:

[coa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team](http://coa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team)

## Klînîka nirxandina pêşemeliyatî (klînîka pêşnirxandinê)

Heger emaliyatek we hebe dibe ku hûn berî çend hefte an roj ji emaliyatê ba klînîka nirxandina pêşemeliyatî werin vexwendin. Ji bo emaliyatên biçûktir, wê dibe ku hemşîre bi we re tîlefônê bike da ku hin pîrsan ji we bipirse.

Ji kerema xwe van tiştan bi xwe re bînin:

- pisoleya nûjen an dermanên xwe yê tam di qutiya de ne bînin.
- çî agahî hebin li ser sehkirin û dermankirinên li nexweşxaneyên din
- agahiyan li ser pîrsgirêkên ku hûn an malbata we li rastê anesteziyê hatin.
- hemû pîvanên xwînpistana yê nû.

Tê pêşniyar kirin ku çaxê bijîşkê malbatê yê we we bişîne emaliyatê divê ew xwînpistana we di cihê emaliyatê de sehbike. Bi vî awayî, heger xwînpistana we zêde be, dermankirin dikare li pêşiya emaliyatê baş were destpêkirin. Ka hûn hewce ne ku dest bi dermankirinê bikin an na, ew dikare bibe alîkar, heger hûn pîvana xwînpistana xwe yê paşîn bi xwe re bînin.

Wê hemşîreyên li klînîkê:

- ji we bi hûratî li ser çalakiya we û her pîrsgirêkên tenduristiya leşî û hişî bipîrsin
- ji we li ser hestokî (alerjî) û bersivan (reaksiyon) bipîrsin (ji kerema xwe hûrgiliyan bînin).
- rêzeke tekûz der hemû dermanan tev yê êşkuj ku hûn bi demdirêjî dibin amade bikin
- ji we bipîrsin gelo hûn cixare dikişînin, alkol vedixwin an jî dermanên kêfê dibin
- giranî û bilindahiya we bipîvin
- xwînpistana we bipîvin û rêjeya dil û asta oksîjenê we sehbikin
- guh bidin dil û sîngê we heger pêwîst be
- li gorî pêdiviyê sehkirina xwîne amade bikin
- Wêneya Nîşandana Kehrebî (ECG)(şopîneya dil) raber bikin
- nimûneyeke ji çerm û/ an pozê bibin da ku jê derxin heger tu teşene (enfeksiyon) heye an na

## Hûn û Anesteziya We

- Ji we re şîret bikin ka divê hûn çî derman di roja emeliyatê de bibin û çî êşhêsanker (dermanê li dijî êşê) li malê xwe piştî emeliyatê bihêlin
- Bi we re agahiyên der xwînguhaztinê parve bikin heger ew difikirin ku hûn dibe ku hewcedariyê vî tiştî bin.



Heger ku ne hewce be xwînguhaztin herdem nayê bikaranîn. Hûn dikarin li ser malpera NHS jî agahiyên bibînin [nhs.uk/what-we-do/blood-service/blood-transfusion](https://nhs.uk/what-we-do/blood-service/blood-transfusion)



Ji kerema xwe belavoka me bixwînin Anestezî hatîye rave kirin heger hûn dixwazin agahiyên berfireh li ser anesteziyê bixwînin: [rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-explained](https://rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-explained)

## Berî hatina ba nexweşxaneyê

Gelek tişt hene ku hûn dikarin bikin da ku hûn xwe ji bo emeliyatê û dema başbûnê amade bikin.

- Heger hûn cixare dikşînin û dev jê berî çend hefteyan ji emeliyatê berdin wê di dema anesteziyê de talûkeya pirsgrêkên henasedanê kêmbike.
- Heger hûn zêde qelew bin, wê kêmkirina giraniya we gelek talûkeyên ku bi dema anestezî û piştî emeliyatê ve hatine girêdan kêmbike. Ew dibe ku emeliyatê jî hêsantir bike.
- Heger diranên we sist bin an bi tacê ve hatine girtin, dibe ku serdaneke ji diransazan re berî emeliyatê zirara xerabûna dirên di dema anesteziyê de kêmbike.
- Heger pirsgrêkeke bijîjkî û demdirêj a we hebe û hûn dihesin ku ew baş nehatiye çare kirin (w.m., nexweşiya şeker, tengenefesî an kuxî, pirsgrêkên zengilokî, êşên domdirêj an pirsgrêkên dil), bila bijîşka/ê we ya malbatê binêre heger tiştê hebe ku hûn rewşê pêş ve bixin an na.
- Herwiha divê hûn pirsgrêkên tenduristî yê nefîsî wek xemxwerî û xemgînî (depresyon) li ber çavê xwe bigirin, çimkî dibe ku bandora wan li ser emeliyatê û başbûnê hebe.
- Çalakiya zêde di heftiyên berî emeliyatê de dikare karûbarê dil û astên tenduristiya we baştir bike. Lêkolînan diyar kirine ku ev dikare cûdahiyek mezin li tenduristiya we ya piştî emeliyatê bîne holê.
- Wê çêtir be ku hûn xwe ji bo dema piştî emeliyatê li malê amade bikin û heval û malbata xwe agahdar bikin ka ew ê çawa bikaribin bi awayekî baş alîkariya we bikin. Divê hûn bifikirin hûn ê çî bixwin û heger hûn hewce ne ku li malê guhartineke çêkin da ku başbûna we hêsantir bike.
- Heger hûn di eynî rojê de piştî bikaranîna anesteziyê geştî an hedarbûnê vegerin li malê, divê hûn yekê/î mezin û berpirsiyar bibînin ku we bi erebe an taksiyê bibe li malê û heya 24 saetan li cem we bimîne. Ji yê ku li yekê/î ku di demeke kurt de anesteziyê geştî an dermanê hedarbûnê biribe binêrin dikarin agahiyên li ser malpera me bibînin: [rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation](https://rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation)
- Girişgêrî ku hûn bifikirin ka di roja emeliyata xwe de hûn çawa bikaribin xwe vehesînin, çimkî berî emeliyatê destpê bike dibe ku hûn li bendê biçekî bimînin. Kovaran, lîstikên puzzlê an guhdana muzîkê bi rêya berguhkan dikarin bibin alîkar.



## Hûn û Anesteziya We



Wê çavkaniyên me yê Serxwe Baştir Zûtir (Fitter Better Sooner) agahiyên girîng der çawa yek serxwe û baştir bibe ji bo emeliyata we peyda bike. Ji bo agahiyên zêde ji kerema xwe malpera me bibînin: [rcoa.ac.uk/fitterbettersooner](https://rcoa.ac.uk/fitterbettersooner)

## Di roja emeliyata we de

Divê nexweşxane şîretên zelal der barê xwarin û vexwarinê bide we. Van şîretan girîng in. Di dema anesteziyê de heger di zikê we de xwarin an tiştê avî hebe, ew dikare hilkişe gewriyê û şîh we û jiyana we bixe talûkeyê.

Heger **nexweşiya şekir** bi we hebe ji kerema xwe ji nexweşxaneyê xwe şîretê bibin **ka divê hûn kengî dev ji xwarinê û vexwarinê berdin û** divê hûn di roja emeliyatê de çawa dermanê xwe bibin.

**Heger hûn cixare dikişînin** divê hûn di roja emeliyata xwe de cixare nekişînin, ji ber ku ev di xwîna we de dibe sedema kêmkirina oksîjenê. Herwiha divê hûn cixareya elektronî nekişînin.

**Heger hûn dermanan dibin**, divê hûn pê şîretên koma nirxandina pêşemeliyatê der birina dermên di roja emeliyatê de bikin. Hûn ê bikaribin ji bo birina dermên dilopeke av vexwin.

Heger hûn dermanan ku "xwîn tenikdikin" wekî warfarin, clopidogrel an rivaroxaban dibin, divê hûn ku bi şêwirmendê xwe an bi koma nirxandina pêşemeliyatê re gotûbêj bikin ka gelo divê hûn kengî wek wan dermanan bibin. Ew ê li her talûkeyên xwîn pijan û sekinandina dermankirinê binêrin û ji we re bernameyeke çêbikin. Wê hemşîreyê/ê we berî emeliyatê şîretên zelal bide we.

Dema ku hûn di roja emeliyatê de ne baş bin, ji kerema xwe bi yê pispore li nexweşxaneyê re bi telefonê bikevin têkiliyê û şîretê ji wan bibin.

Berî hûn werin nexweşxaneyê, ji kerema xwe tu boye an cel li ser neynokên xwe nehêlin. Ev yeka dike ku gira li ser tiliya we di dema anesteziya we de ji bo pîvana oksîjenê baş bixebite.

## Civîna bi bijîşka/ê anesteziyê

Berê emeliyatê, wê bijîşka/ê we ya/ê anesteziyê we bibîne. Dibe ku ev yeka an di klînîka nirxandina pêşemeliyatê de an jî di roja emeliyatê de were pêk anîn. Ew ê bi we re li ser cûreya anesteziyê ya dibe ku hûn bibin tev feyda, talûke û vebijarkên we gotûbêj bikin.

Ew ê bi we re biryar bidin ka kîjan anesteziyê ji bo we çêtirîn e. Ne hemû cureyên anesthesiyê ji bo hemû cureyên emeliyatê licih in.

Heger bijaretîyeke anesteziyê hebe, wê biryara ku kîjan were bikaranîn bi van ve werin girêdan:

- emeliyata we û her pirsgerêkên bijîşkî
- talûkeyên taybet
- vebijarkên we û sedemên wan
- pêşniyar û jêhatiyên taybet ên bijîşka/ê anesteziyê
- amûr, karmend û çavkaniyên li nexweşxaneyê

## Hûn û Anesteziya We

### Pirsên ku hûn dikarin ji anesteziyê an ji hemşîreya/ê xwe bipirsin

Heger der anesteziya we tu pirsên we hebin, wan binivîsin an li mînakên berevajî binêrin. Heger hûn dixwazin rojê berî emeliyatê bi anesteziyê/ê xwe re bipeyivin, bi koma nîrxandina pêşemeliyatî re têkevin têkiliyê da ku ji we re amade bike ku hûn bi telefonê bi anesteziyê re biaxivin an wan di klînîkê de bibînin.

### Ji bo emeliyata xwe xwe amade bikin

Wê hemşîreya/ê we kirasekî yê nexweşxaneyê bide we da ku hûn wî li xwe bikin û ji we re bêje ka hûn dikarin çî ji derpiyan li xwe bikin. Hûn ê bi pîranî goreyên nerm li xwe bikin da ku talûkeya meyînên xwînê di lingên we de kêmbikin. Wê hemşîreya/ê we bizingê nasnameyê li qevdik an jî li gozeka we girê bide û li hinek nexweşxaneyan bizingekê zêde tê girêdan heger hûn bi tu hasasî (alerjî) ketibin.


**Pêşderman dayîn** (pêşderman dayîn) carinan li pêşya hin anesteziyan tê dayîn. Pêşderman dayîn laşê we ji bo emeliyatê amade dikin - dibe ku ew dest bi alîkariya hêsankirina êş bikin, di asîdê di nav zikê de kêmbikin an ji alîkariya we bibin da ku we rehet bikin.

Heger hûn di temenê zarokanî de bin, wê hemşîre bi rêya nimûneya mîzê ezmûna duca nê li ser we bike. Ev karekî stander e.

Divê hûn çî zêr û zîv an çî ji tiştên xemlê yê bi bedena we ve ye ji xwe bixin. Heger hûn nikarin wê ji xwe bixin, wê hemşîreyan wê bi şerîtên zeliqandî rapêçin da ku zirarê negihînin wê an çermê we. Bi pîranî dibe yek gustîla xwe ya zewacê li tiliya xwe bihêle.

### Dema ku hûn ji bo emeliyatê tî gazî kirin

- Wê endamek ji nav karmendan bi we re here li odeya emeliyatê.
- Heta ku hûn di odeya anesteziyê de bin, hûn bi pîranî dikarin berçavkên xwe, amûrên bihîstinê û diranên zêr ên xwe li xwe bikin. Heger hûn anesteziya giştî nabin, hûn dikarin wan li serxwebihêlin.
- Heger hûn di bin bandora anesteziya deverî an jî herêmî de bin, dibe ku hûn amûreke elektronî ya xwe, bi berguhka da ku hûn muzîkê guhdarî bikin bi xwe re binin (lê divê hûn berî emeliyatê bi hemşîreya/ê xwe re der wê biaxivin).
- Hûn dikarin li gel endamekî karmendan an bi rêya kursîya çerxkirî, nivîn an jî bi erebaneke biçin odeya emeliyatê. Heger hûn bikaribin bimeşin, hûn ê bikaribin cil û berg û şimikên xwe li xwe bikin.



## Hûn û Anesteziya We

**Çaxê hûn bigihîjin odeya emeliyatê wê sehkirinên rûfînî berî destpêkirina anesteziyê li ser we werin pêk anîn.** Wê ji we der nav, rojbûn, cûra emeliyata we, ka li aliyê çepê an rastê ye (heger hebe), cara paşîn we xwar û vexwar û heger hûn tu alerjiya we hebe were pirs kirin. Van sehkirinan di hemû nexweşxaneyan de rûfînî ne.

### Destpêkirina anesteziyê

Dibe ku anesteziya we an di odeya anesteziyê an jî di odeya emeliyatê de were destpê kirin. Wê bijîşka/ê anesteziya we bi alîkareke/ê perwerdekirî re bixebite. Wê anestezişt an jî alîkar amûrên pêwîst û her amûreke din heger pêwîst be vêxîne da ku rêjeya kutekua dil, xwînpestan û astên oksîjenê yê we bipêve.

**Derzî,** borriyek biçûk û ji plastîk e ku bi derziyeke li nav demara we tê têxistin. Vê derziyê ji bo destpêkirina anestaziyên tevî ya deverî li ser mirovên gihiştî tê bikar anîn. Bi rêya bikaranîna vê derziyê hemû derman dikarin di nav demarên we re bî dayîn. Heger tu xemên we li ser vê yekê hebin, ji kerema xwe bi anestezişt/ê xwe re bipeyivin.

### Anesteziyên deverî û herêmî

Heger anesteziya deverî an herêmî li ser we hatiye dayîn:

- Wê anestezişt/ê we ji we bixwaze ku hûn wan di dema ku derziyên din tên têxistin de bihêlin. Gava ku anestezişt dest bi bandorkirina xwe dike, dibe ku hûn bi gizgizînek germ bihesin
- Wê emeliyata we tenê were berdewam kirin dema ku hûn û anestezişt/ê xwe piştrast bin ku cihê ku hatiye anestezişt kirin tevî ye
- Bê hedarbûnê, hûn ê ji derdora xwe hişyar bimînin. Bê xwestina we, wê ekrana emeliyatê ji pêş we were girtin.
- di dema anesteziya herêmî de, wê endamek ji koma anesteziyê li ber we be. Îcar çaxê hûn bixwazin hûn ê bikaribin bi wan re biaxavin.

### Anesteziyên giştî

Di destpêkirina anesteziya giştî de du awa hene:

- Dibe ku dermanên anesteziyê bi derziyê di nav demar re werin têxistin. Ev bi giştî yê temen mezin re tê bikar anîn û bêtir tê seh kirin
- hûn dikarin bi rêya rûdankeke gazên anesteziyê û oksîjenê bikişînin ku dibe ku li gorî dixwaza we were hilgirtin. Piştî ku hûn bêhiş bin wê anestezişt/ê we derziyê li we bixe.

### Odeya başbûnê

Piştî emeliyatê, hûn ê bi piranî ba odeya başbûnê bî anîn. Wê karmendên başbûnê piştrast bin ku hûn baş rehet in û herwiha ew ê dermanên zêde bidin we heger hûn hewceya wan bin. Gava ku ew piştrast bin ku hûn ji anesteziya xwe baş hişyar bûne û nivîneke berdest ji bo we hebe, hûn ê dîsa vegerin odeya xwe ya taybet.

## Dermanê dijêşê piştî emeliyatê

Cûre û rêjeya dermanê dijêşê kê ji we re were pêşkêş kirin wê bi emeliyata ku hûn di nav re derbas bûn û astên êşê piştî emeliyatê ve werin girêdan. Hin mirov ji yên mirovên din pirtir hewceyê dermanê dijêşê ne.

Bi giştî, divê hin êş an nerehefî di dema başbûnê de werin pêşbînî kirin. Dibe ku êşkujên bihêztir ji hêsankirina êşê re gelek baş bin, lê dibe ku ew ê bi demê re bandorên alî bînin holê wek vereşîn, qeviz û bengîtiyê.

Carinan êş nîşana agahdariyê ye ku hemû tişt ne di rê de ye, loma divê hûn her gav wê bi hemşîreyên xwe re rapor bikin û li şîret û alîkariya wan bigerin.

Va ye çend cûre ji dermanên dijêşê:

- **dêndik, heb an şileyan ku tên daqurtandin** - ev ji bo hemû cûreyên êş tên bikaranîn. Ew bi giştîkê kêm nîv saet ber xwe dide heta ku ew bibandor bin.. Da kuvandermananbi bandor bin, divê hûn bikaribin bixwin, vexwinû baş bihesin
- derziyan- ew dibe ku ji hûndirê demaran (bi rêya derziyê (kannûla) di nav demarê re bi bandoreke bileztir) an ji hûndirê masûlkeyan re (bi rêya derziyê di nav ling an ranê re, kê di kêmezêde 20 deqîqeyan de bandora xwe nîşan bide) bîn kirin.
- **matifan** - ev dêndikên mûmî di nav rîxoleya we re tên kirin (rêça paşîn). Dêndika dermanî dihele û derman di nav laşê re derbas dibe. Ew kêrhatî ne heger hûn nikaribin dermên daqurtînin an dibe ku hûn vereşin
- **Rawestandina êşê bindestê nexweş (PCA)** - amûrek bi bişkoke ye ku gava hûn wê zext bikin, mêjereke hindik ji dermanê dijêşê yê bihêz yekser li derzî an dilop ve were belav kirin. Ew bernamekirî ye ku hûn nikaribin mêjereke zêde bidin xwe. Amûra PCA we dike hûn rasterast li ser hêsankirina êşa xwe bibin berpisiyar
- anesteziyên deverî û herêmî - van cûreyên anesteziyê ji bo hêsankirina êşê dikarin piştî emeliyatê pir kêrhatî bin. Hûrguliyên zêde di belavoka me de tên dîtin Der hêsankirina êşa jêrî navtengêya piştî emeliyatê di malpera me de hatiye nivîsandin:

[rcoa.ac.uk/patientinfo/leaflets-video-resources](http://rcoa.ac.uk/patientinfo/leaflets-video-resources)

## Hêsankirina êşê piştî derketina ji nexweşxaneyê

Tevî dibe ku dema hûn ji nexweşxaneyê derkevin wê biçekî ji êşkujan bidin we, wê baştir be ku hûn hin êşkujên zêde bikirin ku li malê berdest bin. Heger hûn piştî du hefteyan ji derketina ji nexweşxaneyê hewceyê wan bin, divê hûn bi bijîşka/ê xwe ya/ê malbatê re têkiliyê deynin û li ser wê gotûbêj bikin.

Piştî emeliyata we hûn dikarin bi dermanên êşkûj (wekî morfîn) herin malê. Girîng e ku hûn van dermanan zû zû kêm bikin û paşê bisekinînin çimkî bikaranîna wan piştî demeke dirêj dikare zirareke mezin bidin we.

# Talûke û anestezi

Agahîgirafikên ku di vê beşê de ne bûyer û talûkeyên hevbeş ku bi nexweşên tendurist û gihîştî yê bi giraniya normal in re çêdibe dema ku bi anestaziya giştî emeliyata rûfînê derbas dîkin didin nîşan (emeliyatên pisporî dikarin talûkeyên cûda pêk bînin).

Anesteziyên nûjen pir ewledar in. Ji dermanên anesteziyê an ji amûrên ku tên bikar anîn bandorên hevbeş hene, ku bi piranî ne bitalûke an demdirêjtir in. Wê talûkeyan di navbera kesên de cûda bin û bi rêbaz û teknîka anesteziyê ku tê bikar anîn ve were girêdan.

Wê anestezista/ê we bi we re der talûkeyên ku ew bawer dîkin ku ji we re girîngtir in gotûbêj bikin. Wê anestezîta/ê we bi asayî bi we re der talûkeyên ên kêr-giştî ne tu gotûbêj nekin heger ew bawer bikin ku hûn ne di talûkeya bilind de ne. Di vê belavokê de tu tişt der vê yekê nehatiye nîşandan.



# Hûn û Anesteziya We



Pir giştî ye - zêdetirîl ji 10'an  
beraberî kesekî di malbata we de



Nexweşî



Girîze



Tîbûn\*



Êşa gewriyê



Gerisandin



Wendakirina bîranînêya  
demkî (bi piranî li ser  
salên 60'an)



Hevbeş - di navbera 1 ji 10 û 1 ji 100 de  
beraberî kesekî li kolanê



Êşa li cihê derziyê\*



Birîna sivik a lêv an ziman



UNHevbeş - di navbera 1 ji 100 û 1 ji 1,000 de  
beraberî kesekî li gundekî



Birîna sivik a demar



sêrek - di navbera 1 ji 1.000 û 1 ji 10,000'an de  
Beraberî kesekî li bajarekî biçûk



**1 ji 1,000'an**  
Zirara demar a  
çarkînaî ya ku  
bêdawî ye



**1 ji 2,800**  
Verenîna perdeya  
çavî (xurandina çav)



**1 ji 4,500**  
Zirara li diranan  
ku hewceyê  
dermankirinê ne




**1 ji 10,000'an**  
Anafilaksî  
(reaksiyoneke  
alerjik û giran li  
dijî dermanan)



Pir sêrek – di navbera 1 ji 10,000'an û 1 ji 100,000de an jî zêdetir  
beraberî kesekî li bajarekî mezin



Talûkeyên ku em ji jiyana xwe ya asayî re dibin, **wek mînak çûyîna li ser rêyê**, ku ji talûkeyên li jêr  
bi bandor mezin in.



**1 ji 20,000**

Hişyarî di nav dema anesteziyê de



**1 ji 100,000**  
Wendakirina  
dîtiniyê



**1 ji 100,00**

0 Mirin wekî  
encameke yekser ji  
anesteziyê

\*Lêkolîna Projeya Yekem a Anesteziya Neteweyî ya Sprint (SNAP-1). Br J Anest 2016 (<https://academic.oup.com/bja/article/117/6/758/2671124>).



Heger hûn dixwazin zêde der van bûyer û talûkeyan bixwînin ji kerema xwe belavokên talûkeyên  
takekesî yên ku li ser malpera me hene bibînin: [coa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets](https://coa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets)

Herwiha hûn dikarin bi rêya girêdana ya li jor agahîgirafîka ya li jor wekî karteke cuda ji xwe re  
daxînin.

## Hûn û Anesteziya We

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi tîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin niqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev ji bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir [bitîkînin](#).

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsînor) tînen çêkirin. Çawanîya van wergeran ji bo duristîya van heta ji dest tê ten venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

## Ka ji me re bêjin hûn çî difikirin

Pêşniyarên we ji bo pêşketina vê belavokê li ser serê me ne.

Heger hûn dixwazin şîroveyên xwe bêjin, ji kerema xwe wan bi wek peyam ji me re bişînin: [pacientinformation@rcoa.ac.uk](mailto:pacientinformation@rcoa.ac.uk)

### **Royal College of Anaesthetists (Zanîngeha Mîrane ya ji bo Anestezîstan)**

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

020 7092 1500

**rcoa.ac.uk**



### **Çapa Pêncan, Sibat 2020**

Wê belavok ji roja weşanê ve di nav sê salan de were şîrove kirin.

© 2020 Royal College of Anaesthetists (Zanîngeha Mîrane ya ji bo Anestezîstan)

Dibe ev belavok ji bo armanca sazkirina materyalên agahiyên ên nexweşan were rûnivîs kirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya resen lêwer bigirin. Heger hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê agahîkirineke licih were nivîsandin û divê logo, marqe û wêneyan jê werin rakirin. Ji bo agahiyên zêde ji kerema xwe bi me re têkilî deynin.